Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Jimar :782 29-Tîrmeh- 2020 Rojnameya Siyasî û Çandî

Komkujiya Til Hasil û Til Eran, sedem û armancên wê

Çeteyên Cebhet El-Nusra û komên alîgirên wê 27, 28 û 29'ê Tîrmeha 2013'an li bajarokê Til Hasil û navçeya Til Eran êriş û komkujî kirin. Di encamê de nêzî 50 sîvîlî hatin kuştin.

KURTEDÎROKA TIL HASIL Û TIL ERANÊ

Bajarokê Til Hasil ku şêniyên wê Kurd in, 17 km li başûr-rojhilatê Helebê li ser riya gişti Heleb-Sifêrê ye. Bajarokê piştî kargehên kebil û betariyan e û bi bajarê Til Eran ve ye. Herêma Sifêrê û bajarê Waha nêzî 8 km jê dûr e. Jimara şêniyên wê nêzî 15 hezarî ye. Kurdên misliman û êzîdî û eşîra Dendaya(Dena) lê dimînin. Xaka wê ji bo çandiniyê baş e.

Navçeya Til Eran (Girê Aran-Girê Arana) a Kurdî, li aliyê rojhilat-başûrê Helebê nêzî 20 km û bi bajarokê Til Hasil yê Kurdî ji aliyê bakurê rojhilat ve. Di nav re rêya gişti Heleb-Sifêrê-Waha der-bas dibe, hejmara şêniyên wê zêdetirî 35 hezarî ye.

DI 2013'AN DE LI TIL HASIL Û TIL ERAN ÇI QEWIMÎ?

Di destpêkA aloziya Sûriyê de, şêniyên bajarokê Til Hasil û Til Eranê hêzeke xwe ya taybet bi navê Cebhet Ekrad ava kirin. ErkÊ wê jî parastina welatiyan bû. Ev hêz heta bi Minbic, Tebqa û Reqa çû û bawerî da gel û meclisa sîvîl jî hat avakirin.

Komên çete 27, 28 û 29'ê Tîrmeha 2013'an êrişî Til Eran û Til Hasil kirin û komkujî li ser şêniyan kirin. Li ser sedem û armancên van êrişan Parêzer Elaedîn Xalid yê ji bajarokê Til Hasil ji ANHA re axivî.

Elaedîn Xalid wiha got: "Derbarê komkujiya Til Hasil û Til Eranê de amadekarî hebûn. Destpêka aloziya Sûriyê şêniyên Til Hasil û Til Eranê nehiştin komên bi navê "Artêşa Azad" derbasî Til Hasil û Til Eranê bibin. Bi insiyatîfa rûspiyan her du bajarokan komek ji ciwanan hat avakirin. Bi wê re jî aramî li herêmê çêbû û gelek koçberên ji bajarê Helebê berê xwe dan wir."

Xalid axaftina xwe wiha domand: "Wê demê bi navê "Artêşa Azad" şerê rejîma Sûriyê dihat kirin. Piştî ku li Humisê têk çûn, paş de kişiyan. Di heman demê de 24'ê Hezîrana 2013'an, bi çavdêriya MÎT'a Tirk civînek di navbera komên çete yên bi serkêşiya serçeteyê bi navê Ebdulcebar El-Egêdî li bajarê Dîlokê (Gazîentabê) çêbû. Di civînê de komên çete tev hebûn û biryara qirkirina gelê Kurd dan."

Xalid sedema êrişê wiha vegot: "Ditirsiyan ku Efrîn bi bajarê Kobanê ve were girêdana. Ji ber wê MÎT'a Tirk xwest gelê Kurd û wê hêzê têk bibe, bajarê Efrînê ji Kobanê qut bike. Ew jî bi hevkariya komên çete pêk hat.

LI SER ZIMANÊ ŞAHID Û BEŞDARÊ BERXWEDANA TIL HASIL BÛYERÊN KOMKUJIYÊ

Cûma Kalo, wê demê serokê Meclisa Sîvîl ya bajarokê Til Hasil û Til Eranê bû. Herwisa beşdarî berxwedanê bûye. Cûma Kalo derbarê bûyerên di nava 3 rojan de çêbyîn wiha dibêje: "Roja 27`ê Tîrmehê rewş normal bû. Me ti êriş li ser herêmê texmîn nedikirin. Destpêkê êrişî navenda Cebhet El-Ekrad ya li bajarokê Til Hasil kirin. Paşê bajarok dorpêç kirin. Di wan kêliyan de malbateke ji 5 kesan ji navçeya Til Eran ber bi navçeya Til Hasil ve diçû. Çeteyan gulebaran kirin û tev kuştin. Dema êrişî navenda Cebhet El-Ekrad kirin, hewl dan derdora bajarok bigirin. Şêniyên gund dest bi berxwedanê kirin. Ciwanan êrişa wan şkand. Erebeyên wan û alavên leşkerî desteser kirin. Çete derbasî mizgefta gund bûn. Dema nimêja berêvarê bû. Derfet nedan şêniyan ku nimêj bikin û nehiştin mele bag bide. Sekvanên xwe jî li ser mizgeftê danîn."

Cûma Kalo vegotina bûyerê wiha domand: "Êrişa destpêkê nêzî 3 saetan dewam kir. Çeteyan saetên fitarê agirbest ragihandin. Ji aparloyên mizgeftan banga teslîmbûnê dikirin. Herwiha digotin mal, can û hevjînên we li me helal in. Şêniyên bajarok bihêrs bûn. Biryar dan ku heta dawiyê li ber xwe bidin. Piştî fitarê şer heta saet 02:00`an dewam kir. Me deriyên ketina bajarok yên sereke dorpêç kirin.

Çeteyan alîkarî ji çeteyên din xwest. Nêzî 10 hezar çeteyan êriş kir. Roja 28`ê Tîrmeha 2013`an şer giran bû. Ji bo parastina zarok û jinan me ji bajarok derxistin. Çekên li gel me yên sivik bûn.

29`ê Tîrmeha 2013`an piştî ku di şerê bajarokê Til Hasil de têk çûn berê xwe dan Til Eranê. Paşê me bihîst ku Til Eran dagîr kirine. Piştî nîvro navçe dorpêç kirin û berê xwe dan bajarokê Til Hasil. Tiştek li pêşiya me nema ji bilî vekişandinê. Lewre em ditirsiyan ku komkujiyan bikin. Em ji bajarok vekişiyan.

BERXWEDANA ŞÊNIYAN

Cûma Kalo bi van gotinan behsa berxwedana şêniyên Til Hasil û Til Eranê kir: "Di destpêka êrişan de çeteyan texmîn dikir ku wê di nava çend saetan de navçeyê bistînin. Dest bi girtina sîvîlan kirin. Li gorî agahiyan wê demê ku nêzî 400 kesî hatin girtin di nav de jin û zarok hebûn û 45 kes jî şehîd bûn.

Komkujiya bajarokê Til Hasil û Til Eran heta niha li bîra zarokên wan e. Nêzî 50 sîvîlî şehîd bûn. Hinek ji wan şehîdan ev in ;Ehmed Eto, Îbrahîm Şemo, Îbrahîm Kalo, Ehmed Eskîf, Cûma Dibyan Kalo, Hecî Adil Eto, Hesen Hec Mihemed, Hisên Îbrahîm, Abdullselam Beşar, Hemam Terbûş, Hemûd Ercûn, Xelîl Daşir, Rakan Eskîf, Ridwan Qasim Hemadî Kalo, Semîr Hewa, Arif Eto, Abdullrezaq Bişar, Ebdo Eskîf, Elî Eskîf, Mihemed Bîlal, Mihemed Hewa, Mihemed Mamat, Nûrî Ercûn û Yehiya Faris.

Dîroka mirovan a li Bakurê Emerîka du qatan pirtir kevin e

Li gotî keşfên nû yên ji aliyê arkeologan ve tên kirin, derket holê ku tê texmînkirin bicihbûna mirovên destpêkê yên li Bakurê Emerîka du qatan pirtir kevin e.

Li gorî lêkolîna Kovara Natûre, bermayiyên di Şikefta Chîqûîhûîte ya li bakurê Meksîka hatîn dîtin, hat ragihandin ku civakîbûna mirovan ya li wê deverê dîroka wê diçe 33 hezar salan berê û piştrast jî dike ku 20 hezar salan jî domiyaye.

Di nava bermayiyên di şikeftê de hatîn dîtin de, 1900 parçeyên ji kevirên hatî necirandin hatine dîtin.

Ji nivîskarên lêkolînê arkolog Cîprîan Ardelean got, "Lêkolîna me têkildarî hebûna mirovên herî kevin yên li Parzemîna Emerîka delîlên nû pêşkêş dike." Parzemîna Emerîka wisa tê zanîn ku parzemîna herî dawî ye ku mirov lê bicih bûne.

Mînaka herî kevin ya li şikeftê hatî dîtin, dîroka wan digihe 33 hezar heta 31 hezar salan berê. Her çendî li qadê hestiyên mirovan bên dîtin û mînakên DNA'yê bên dîtin jî, ev der ji aliyê mirovan ve ji aliyê koçberiyê ve wek cihekî sabit hatiye bikaranîn.

Li gorî lêkolînên anropolog û arkeologan dîroka mirovê destpêkê ya li Emerîka herî zêde 13 hezar sal berê tê nirxandin. Lê bi keşfa dawî dîroka mirovayiyê gihatibû 16 hezar salan berê.

Sonda Ereban ya yeke ber bi Marsê ve hat şandin

Sonda fezayê ya Îmaratê ber bi Marse ve bi rê ket. Tê payîn ku amûra fezayî Sibata 2021'ê bigihe hedefa xwe.

Amûra fezayî ya bêmirov El Emel (Hêvî) sibeha Duşema borî ji navenda fezayî ya Japonya Tanegashîma hat şandin. Hefteya derbasbûyî ji ber rewşa hewayê ya ne baş şandina amûra fezayî du caran hatibû paşxistin.

Şandina sonda fezayî ya ber bi Marsê ve, li Îmaratê bi coş hat pêşwazîkirin. Ji birca herî bilind ya cîhanê Birc Xelîfe ya li Dûbaiyê, berî rabûna sondayê bi rengekî sembolîk ji 10'an ber bi jêrê ve hat jimartin.

Tê plankirin ku sonda di Sibata 2021'ê de bigihêje dorhêla Marsê. Ev dem jî salvegera

50'î ya yekbûna heft prensiyên Îmarat e.

Sonda wê atmosfera Gerstêrka Sor lêkolîn bike û tê payşn ku daneyên li ser guhertina klîmayê ya salekê ya li gerstêrkê bişîne.

Tê payîn ku ji Îlona 2021'ê pêve El Emal dîmenên Marsê bişîne. Îmarat ku dewlemendê petrolê ye û bi jiyana luks tê naskirin. Hewl dide li qada teknolojiyê jî bibe aktoreke girîng û plan dike ku sedsala bê li Marsê koloniya destpêkê ya mirovan ava bike.

Şêniyên Qamişlo Şehîd Şoreşvan spartin axê

Şêniyên bajarê Qamişlo bi merasimekê cenazeyê şervanê QSD`ê Talal Ehmed (Şoreşvan Qamişlo) li goristana Şehîd Delîl Sarûxan spartin axê.*R-5*

Cenazeyê şehîd Riyad Giûd li Tirbespiyê hat veşartin

Şervanê Hêzên Erkê Xweparastinê Riyad Giûd ku li ser erkê xwe şehîd bûbû li goristana Şehîd Dilşêr ya li gundê Dugirê yê navçeya Tirbespiyê hat veşartin. *R-2*

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Jimar : 782 29-Tîrmeh- 2020 Rojnameya Siyasî û Çandî

Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê jimara kesên bi Koronavîrûsê ketîn bû 8

Hevserokê Desteya Tendurustiyê ya Rêveberiya Xweser ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê Dr. Ciwan Mustefa diyar kir ku li herêmên Rêveberiya Xweser ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê du kesên din Koronavîrûsê ketine. *R-2*

Rêxistina Jinên Ciwan ya PYD`ê Konferansa xwe ya yekê ya Damezrîner li dar xist

Rêxistina Jinên Ciwan ya PYD'ê bi durişma `Bi rêxistinkirina jinên ciwan li ser bingehê felsefeya Serok Apo digihîje Sûriyeya demokratîk` Konferansa xwe ya yekê ya Damezrîner li dar xist û meclisa xwe ya Rojava ava kir. *R-3*

Ji ber şewitandina bermayiyên zeviyan, ziyaneke mezin çêbû

Li gundên herêma Beravê ya Dêrikê, ji ber şewitandina bermayiyên zeviyên çandiniyê gelek ziyana madî çêbû. *R-6*

Pêşangeha 4an ya Pirtûkan ya Şehîd Herekol bi dawî bû

Piştî 5 rojên bênavber roja Înê Pêşangeha 4an ya Pirtûkan ya Şehîd Herkol qediya. Di roja dawî de şeş beşên tevlî pêşangehê bûyîn pirtûk bi diyarî belav kirin. *R-7*

Şehîdên komkujiya Til Eran û Til Hasil

Di ser komkujiya Til Eran û Til Hasil re 7 sal derbas bûn, lê çawa ku doh çêbûbe hê dîmenên wan rojên reş li ber çavên Kurdan in. Komkujî 27, 28 û 29'ê Tîrmeha 2013'an bi destê DAIŞ, El-Nusra û Meclisa Leşkerî ya Helebê çêbû. Bi parloyên mizgeftan bang kirin, gotin; jin, zarok û mal û milkê we ji me re helal in, teslîm bibin. Di wan êrişên hovane de 50 sîvîl şehîd bûn. *R-2*

Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê jimara kesên bi Koronavîrûsê ketîn bû 8

Hevserokê Desteya Tenduristiyê ya Rêveberiya Xweser ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê Dr. Ciwan Mustefa diyar kir ku li herêmên Rêveberiya Xweser ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê du kesên din Koronavîrûsê ketine.

Dr. Ciwan Mustefa diyar kir ku li Hesekê jinek û li bajarê Dêrikê jî jinek bi nexweşiya Koronavîrûsê (Covid-19) ketine. Herwiha da xuyakirin ku her du jinên bi nexweşiyê ketîn di binê çavdêriya tibî de ne. Desteya Tenduristiyê berî niha ragihandibû ku 6 kes bi Koronavîrûsê ketine.

Bi vî awayî jimara kesên li herêmên Rêveberiya Xweser bi Koronavîrûsê ketîn bû 8.

Cenazeyê şehîd Riyad Giûd li Tirbespiyê hat veşartin

Şervanê Hêzên Erkê Xweparastinê Riyad Giûd ku li ser erkê xwe şehîd bûbû li goristana Şehîd Dilşêr ya li gundê Dugirê yê navçeya Tirbespiyê hat veşartin.
Ji bo tedbîrên pêşîgirina li belavbûna Koronavîrûsê, merasima girseyî çênebû.
Endamê rêveber yê Meclisa Malbatên Şehîdan Mihemed Zekî Îbrahîm li goristanê ku axivî sersaxî ji malbata şehîd re xwest û got, bi saya keda şehîdan, me teror şkand û herêmên xwe parastin."
Îbrahîm soza şopandina riya

şehîdan û têkoşîna avakirina civakeke azad û demokratîk da. Piştre nasnameya şehîd hat xwendin û radestî malbatê hat kirin.
Bi lilîliyên dayîkan û durişman cenazeyê şehîd spartin axê.

Heyva Sor ya Kurdî: 88 kesên bi nexweşên Covid-19 re danûstandin kirîn ketin karantînaya malê

Rêxistina Heyva Sor ya Kurdî diyar kir ku 88 kes ku piraniya wan ji Qamişlo ne bi nexweşên Koronavîrûsê re dane û standine. Herwiha rêxistinê diyar kir ku ew kes di karantînayê de ne û rojane rewşa wan dişopînin.

Desteya Tenduristiyê ya Rêveberiya Xweser ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê Pênçşema borî li bajarê Qamişlo di civîneke çapemeniyê de ragihadibû ku 4 kes bi Covid-19 ketine. Ji wan sisê li Qamilo, yek li Hesekê ye. Derbarê mijarê de Heyva Sor ya Kurdî li gorî daxuyaniya roja Înê li ser malpera xwe ya fermî belav

kirî, jimara kesên bi nexweşên Koronavîrûsê re têkilî danîn herî kêm 88 e. Li aliyekî din diyar kir ku ew kes hatin agahdarkirin ku wê heta 2 hefteyan di kakraknktînayê de bimînin.
Heyva Sor di daxuyaniya xwe de da zanîn ku piraniya 88 kesan ji bajarê Qamişloy ne. Heta niha ti nîşanên nexweşiyê li ser wan diyar nebûne. Tîma Hevya Sor ya Kurdî jî rojane rewşa nexweşan dişopîne.

Şehîdên komkujiya Til Eran û Til Hasil hatin bîranîn

Komîteya Koçberên kantona Şehba yên li bajarê Minbicê, bi daxuyaniyekê şehîdên komkujiya Til Eran û Til Hasil bîr anîn.

Bi pêmana salvegera 7'an ya komkujiya li Til Eran û Til Hasil yên bakurê bajarê Helebê, Komîteya Koçberên kantona Şehbayê ya li Minbicê daxuyaniyeke nivîskî weşand.
Di daxuyaniyê de bang li Neteweyên Yekbûyî û Konseya Ewleyiyê hat kirin ku ji bo cezakirina sûcdarên komkujiyê derbarê sûcên dewleta Tirk û çeteyên wê de komîteyeke lêpirsînê were avakirin.
Di daxuyaniyê de hat bîrxistin ku 7 sal di ser komkujiya Til Eran û Til Hasil re derbas bûn, lê mîna ku ew komkujî doh çêbûbe em bîr tînin. Wan rojên reş bi êrişên DAIŞ, El-Nusra û Meclisa Leşkerî ya Helebê 27'ê Tîrmehê li dijî mizgeftekê dest pê kir.
Bi mîkrofonê mizgeftê bang kirin, gotin; jin, zarok û pereyên we ji me re helal in, teslîm bibin.
Şêniyên her du gundan zêdeyî 50 şehîd dan. Piştre cîhanê rastiya kesên digotin, em ji bo rizgarkirina dînê xwe hatine, nas kir. Lê bi cenazeyên şehîdan listin, nehiştin di goran de werin veşartin, jin, zarok û extiyar girtin û milkên wan talan kirin û dizîn."
Herwiha hat gotin sûcên li dijî

Til Eran û Til Hasil hatîn kirin îro li Efrîn, Girê Spî û Serê Kaniyê dûbare dibin.
Di daxuyaniyê de bang li Neteweyên Yekbûyî û Konseya Ewleyiyê hate kirin ku derbarê sûcên dewleta Tirk û çeteyên wê de komîteyeke lêpirsîn ava bikin û kesên li piştê van sûcan eşkere bikin û darizînin.

Di bombebarana balafirên Tirkiyê ya ser Bamernê de welatiyekî sîvîl şehîd bû

Di êrişa balafirên dewleta Tirk ya dagîrker ya li gundê Hesenpîrkê ya bajarokê Bamernê de welatiyekî sîvîl şehîd bû.
Li gorî nûçeya Roj News'ê de hatî parvekirin, êvara Yekşemê balafirên dewleta Tirk ya dagîrker li gundê Hesenpîrkê yê bajarokê Bamernê yê girêdayî navçeya Amêdiyê ya Başûrê Kurdistanê 2 wesait bombebaran kirin.
Tê gotin di bombebaranê de welatiyekî sîvîl şehîd bûye. Hat zanîn ku navê wî Dilovan Şahîn Omer Keşanî ye û ji eşîra Gulî ye.

Dagîrker dîwarê beton li gundên dagirkirî datînin

Hêzên dewleta Tirk ya dagîrker li gundewarê Til Temir yê nêzî riya M4 dîwarê beton datînin û xendekan dikolin.

Roja dewleta Tirk ya dagîrker û çeteyên bi navê "Artêşa Niştimanî ya Sûriyê" bajarê Serê Kaniyê û Girê Spî dagîr kirîn û gihatîn nêzî navçeya Til Temir ya kantona Hesekê, heta niha li dijî gelê herêmê kiryarên hovane dikin.
Ji wê demê ve bi dehan baregehên leşkerî hatine avakirin û bi çekên giran û hêzên Komandos yên Tirkiyê hatine amadekirin ku çete parastina wan dikin.
Dewleta Tirk ya dagîrker di demên dawn de dîwarê beton anîn gundewarên li ser xetên şer yên li ser riya navneteweyî (M4) ya rojavayê Til Temir.
Çavkaniyekê ji herêmê diyar kir ku dewleta Tirk kamyonan bi şev tîne da ji ragihandinê dûr be.
Herwiha kolan û lêkirina satiran dike.
Heman çavkaniyê da zanîn ku dewleta Tirk satirên li ser baregeha xwe ya leşkerî ya li gundê Amiriyê yê nêzî riya (M4) rakirin û di hundirê baregehê de kolanê dike.
Çavkaniyeke leşkerî jî got dewleta Tirk di çend mehên derbasbûyî de ji gundê Erîşa heta gundê Dawidiyê yê rojavayê Til Temir xendekan dikole.

Pêşangeha 4an ya Pirtûkan ya Şehîd Herekol bi dawî bû

Piştî 5 rojên bênavber roja Înê Pêşangeha 4an ya Pirtûkan ya Şehîd Herkol qediya. Di roja dawî de şeş beşên tevlî pêşangehê bûyîn pirtûk bi diyarî belav kirin.

Pêşangeha 4an ya Pirtûkan ya Şehîd Herekol 20`ê Hezîranê dest pê kir. Gelek weşanxane, yekîtiyên nivîskaran, rewşenbîr û nivîsgeh si seranserê Bakur û Rojhilatê Sûriyê tevlî pêşangehê bûn. Di wan 5 rojan de gelek pêkhateyên herêmên cuda Kurd, Ereb û Suryan serdana pêşangehê kirin.
Di roja dawî ya pêşangehê de wêneyên Heyva Sor ya Kurdî dema sîvîlan xilas dike, hatin pêşandan.
Gelek welatî, nivîskar û rewşenbîran serdana pêşangehê kirin. Şeş beşên tevlî pêşangehê bûyîn 53 hezar pirtûk bi diyarî dan.
Di merasima qedandina pêşangehê de endamê Komîteya Amadekar ya Pêşengeha Herekol Ebûd Mexso ji bo parastina beşdarên pêşangehê spasiya Hêzên Ewlekariyê û Komîteya Tenduristiyê kir.
Komîteya Amadekar wêneyê Şehîd Herekol radestî dayîka wî kir. Herwiha pirtûk li beşdarên pêşangehê belav kirin û ji bo çapkirina pirtûkên wan bêpere, navên sê nivîskaran (Salihê Heydo, Xidir El-Hemadî û Konê Reş) pêşniyar kirin. Komîteyê zaroka bi navê Rene Egîd ya çavdêriya beşa pirtûkên zarokan dikir xelat kir.
Dihat payîn ku pêşangeh 25`ê mehê biqede, lê piştî ku Desteya Tenduristiyê ragihand ku çend kes li bajarê Qamişlo û Hesekê bi koronavîrûsê ketine, Komîteya Amadekar ji bo parastina welatiyan, pêşengeh roja Înê bi dawî kir.

Cemîlê Kor, vebêjê helbestên gerok

Helbestvan Apo Cemîl Îso (91) ji zimanê kurdî pir hes dike û tê de pispor e. Qermiçên li ser rûyê wî, çîroka têkoşîna wî vedibêjin. Bi dehan beytên helbesta kurdî ji ber kirine û li her derê dibêje. Heta ku navê 'Vebêjê helbestên gerok' lê hatiye kirin.
Apo Cemîl Îso (91) yê bi navê Cemîlê Kor tê naskirin, ji bajarê Qamişlo ye. Neçûye dibistanan û şivantî kiriye. Lê ji zimanê dayîka xwe zimanê kurdî pir hes dike. Ji ber wê heskirinê her tim bi helbestvanê Kurd Cegerxwîn, Mele Ehmed Balo û Mele Ehmed Namî re dimîne.
Di Pêşangeha 4an ya Pirtûkan ya Şehîd Herekol digeriya û bi dengê xwe yê xweş helbest digotin. Ji ber wê bala beşdarên pêşangehê kişand.
Li gorî nivîskar Ebdo Mexso, helbestvanê Kurd Cegerxwîn di helbesteke xwe de Cemîlê Kor bîr xistiye. Mexso diyar kir ku gelek caran ji hêla desthilatên hikumeta Sûriyê ve hat girtin. Lewre helbestên kurdî hem li kolanan hem li şahiyan digotin. Çîroka Cemîlê Kor di ciwantiyê de dest pê dike, di wî demî de şivan e. Dema dibihîze ku Cegerxwîn li bajarê Qamişlo ye, dev ji pezê xwe berdide û diçe da bibîne.
Herwiha nivîskar û helbestvanê Kurd Mele Ehmed Nemî jî nas dike û derfeta fêrbûna zimanê Kurdî bi dest dixe. Cemîlê Kor di vî warî de wiha dibêje: "Helbestvan Mele Ehmed Nemî ez fêrî zimanê Kurdî kirim. Her roj 5 tîp didan min. Lênûskek û pênûsek diyarî min kirin. Min dersa xwe serê sibehan li ber pez dubare dikir."
Cemîlê Kor baş fêrî tîpên kurdî dibe û helbestan ji ber dike.
Apê Cemîl dibêje, bi gelek siyasetvanên Kurd yên salên 60 û 70`î yên mîna Nûredîn Zaza re rûniştiye.
Apê Cemîlê Kor di qada çandî û wêjeyî ya herêma Qamişlo de bi 'Vebêjê helbestên gerok' tê naskirin. Apê Cemîl vegotina helbestan ji xwe re erk dibîne û pê serfiraz e.

Helbestvanên Ereb: Pêşangeha Herekol cihê rengîniya çand û olan bû

Helbestvanên Ereb yên beşdarî Pêşangeha Pirtûkan ya Şehîd Herekol ya Çaran bûyîn, diyar kirin ku pêşangeh rengê çand û olên li herêmê nîşan dide.
Helbestvanên Ereb diyar kirin ku vekirina Pêşangeha Herekol hişt ku çand, ol û civakên cuda nas bikin.
Helbestvanê bi navê Ehmed Yûsiv yê ji bajarê Minbicê, cara sisiyan e beşdarî Pêşangeha Pirtûkan ya Şehîd Herekol dibe. Ehmed Yûsiv behsa atmosfera pêşangehê, hevrûkirina salên berê û îsal kir û got, "Min pêşketin di çalakiyên pêşangehê de dît, her sal pêşangeh bi rengekî hunerî tê naskirin û nîşana vê di pêşketina tevgera çandê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê de ye."
Yûsiv diyar kir ku bi hêvî ne ku zêdetir çalakiyên çandî li dar bikevin. Lewre rûyê Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji cîhanê re, asta şaristaniyê û pêşketina herêmê raber dike.

Helbestvan Mistefa Hac ji Tebqayê beşdarî pêşangehê bûye û wiha axivî: "Yekîtiya Rewşenbîrên Tebqa ez vexwendim vê pêşangehê. Ev cara yekê ye ku bi dîwanekê ku ji 38 helbestên xezelî pêk tê, tevlî pêşangehê dibim."
Mistefa Hac da zanîn ku pêşangeh bi awayekî giştî wêneyekî şaristaniyê diyar dike û di aliyê rêxistinî de jî baş bû. Hac got, dema ez li pêşangehê digeriyam rastî hevgirtineke çandî hatim ku pirtûkên çandî, siyasî, dîrokî, olî û her wekî din hatim.
Hac bal kişand ser beşdarbûna pêkhateyên Ereb ji pêşangehê re û got pirtûkên bi zimanê erebî mase dagirtibûn, heta nivîskarên wan jî nayên naskirin.

Rewşenbîrên Efrînê li Til Rifetê pirtûkxaneyek vekirin

Rewşenbîrên Efrînê yên koçberî Şehba bûyîn, li bajarokê Til Rifet pirtûkxaneyek vekirin. Armanca vekirinê ew e ku çanda xwendinê di nava civakê de belav bikin.
Piştî xebata du meh û nîvê ji bo komkirina pirtûkan, berpirs û çavdêrên pirtûkxaneyê bi merasimekê Pirtûkxaneya Navenda Zanist û Ronakbîriyê vekirin.
Bi dehan welatî tevî nûnerên sazî û meclisên herêmî yên bajarokê Til Rifet li kantona Şehba tevlî merasima vekirinê bûn.
Di merasimê de damezrînerê pirtûkxaneyê Mihemed Mihemed spasiya kesên beşdaran kir û wiha got: "Armanca me ji vekirina pirtûkxaneyê ew e ku çanda xwendinê û ronakbiriyê di nava civakê de belav bikin. Lewre civak bi xwendinê bi pêş dikeve û armancên xwe bi cih tîne."
Herwiha ji damezrînerên pirtûkxaneyê Xelîl Hibo bang li ciwanan kir ku berê xwe bidin pirtûkxaneyê û wiha got: "Divê civak û bi taybetî ciwan berê xwe bidin pirtûkxaneyê da çand û fikirê dewlemend bistînin û bikarin bi riya wê xwe û civakê pêş bixin."
Di pirtûkxaneyê de nêzî 400 pirtûkên siyasî, çîrokên cîhanî,

pirtûkên zanistî û hwd hene. Berpirsên pirtûkxaneyê diyar kirin ku hewl bidin jimara pirtûkan zêde bikin.
Sadik Berekat, Mihemed Mihemed û Xelîl Hibo damezrînerên pirtûkxaneyê ne û ji bajarê Efrînê ne. Hemûyan jî zanîngeh qedandiye. Hina beşa qanûna navneteweyî qedandiye, hin jî lêkolînerên dîrokî ne.

Xelatên pêşbirka Şehîd Viyan Amara hatin belavkirin

Yekîtiya Rewşenbîran ya Kobanê kesên di pêşbirga Şehîd Viyan Amara de bi ser ketîn, xelat kirin. Pêşbirka Şehîd Viyan Amara 7`ê Hezîranê dest pê kiribû û roja Yekşemê bi şahiyekê xelatên wê hatin belavkirin.
Şahiya belavkirina xelatan li Navenda Baqî Xido ya Çand û Hunerê ya li Kobanê hat lidarxistin.Di şahiyê de hevseroka Yekîtiya Rewşenbîran ya Kobanê Leyla Ebdo axivî û şehîd Viyan Amara û rola wê ya di belavkirina zimanê Kurdî de bîr xist.
Piştre parêzer Ferhad Baqir axivî û rola şehîd Viyan Amara ya di warê perwerdeyê de destnîşan kir. Di şahiyê de hunermend Stêrvan Bozan stiran gotin.Paşê endamên rêveber yên Yekîtiya Rewşenbîran Leyla Ebdo, Selah Muslim, Şêrîn Şêxo û Hisên Mihemed diyarî li kesên bi ser ketîn belav kirin.
Navên kesên serkeftî wiha ne: Lîlav Îsa, Xalîsa, Hesen Mihemed Misto, Zîlan Hemo, Evîn Teyfûr, Izet Hebeş, Setam Ebdullah, Zozan Bozan, Fatme Baz, Necla Bozan û Nesrîn El-Elî.
Şehîd Viyan Amara ji avakerên saziya zimanê Kurdî ya li Kobanê ye. Piştî êrişên Cebhet El-Nusra û komên çeteyên din yên ser Kobanê sala 2013`an, Viyan tevlî Yekîneyên Parastina Jinê bû û li gundê Kendal yê li gundewarê Girê Spî 25`ê Tîrmehê şehîd bû.

Ji ber şewitandina bermayiyên zeviyan, ziyaneke mezin çêbû

Li gundên herêma Beravê ya Dêrikê, ji ber şewitandina bermayiyên zeviyên çandiniyê gelek ziyana madî çêbû.

Li gundê Til Darê û Rihanîkê şivanan agir berda bermayiyên zeviyên çandiniyê. Di encamê de medceneyek û hingarek bi tevayî şewitîn. Herwiha ziyaneke mezin gihat baxçeyên sebze û meyweyan.
Xwediyê baxçe Ronî Sadiq got, "Ez li Dêrikê bûm, zarokên min bi min re axivîn gotin di hingar û baxçe de şewat çêbûye. Yekser ez bi agirkujiyê re axivîm. Dema agirkuj gihatin wir, medcene û alavên çandiniyê şewitîbûn. Ziyaneke mezin gihat daran û xortûmên ku bihayê wan bi qasî du milyon lîreyên Sûrî bû."
Beriya çend rojan li gundên navçeya Amûdê jî ji ber şewitandina bermayiyên çandiniyê agir bi stûnên kehrebeyê ketibû û kehrebeya bi dehan gundan qut bûbû.
Desteya Enerjiyê ya Herêma Cizîrê bang kiribû ku bermayiyên zeviyên çandiniyê neşewitînin.

Yekîtiya Kedkaran: Divê kedkar xwe birêxistin bikin

Karkerên rojane kar dikin bi taybetî yên tevlî Yekîtiya Kedkaran nebûyîn, rewşa wan ya aborî giran e. Gelek caran bêkar dimînin û carna jê ji aliyê xwediyê kar ve tên bikaranîn. Li aliyekî din endama rêveber ya Yekîtiya Kedkaran bang li wan kir ku xwe di binê banê yekîtiyê de birêxistin bikin da mafên xwe misoger bikin.
Li bajarê Qamişlo gelek karkerên ku rojane kar dikin, hene û li benda kar dimînin. Daketina lîreyê Sûriyê, bi awayekî neyînî bandor li aboriya Sûriyê kir. Herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê jî ji vê rewşê bibandor bûn. Gelek karkerên ku rojane kar dikin bêkar mane. Nikarin her roj kar peyda bikin. Li rex wê jî destheqê wan jî kêm e. Bi vî awayî barê wan giran dibe û rewşa jiyanî ya wan aloztir dibe.
Karkerê bi navê Fîras Xêredîn Emrû (31) got, "Ev 13 sal in ez kar dikim. Ji berbanga sibehê heta piştî nîvro, li ser peyarê rûdinim."

DERFETÊN KAR CAREKE DIN PEYDA NABIN

Emrû diyar kir ku hin caran kar dibînin û hin caran heta mehekê bêkar dimînin û wiha axivî: "Xwediyên kar me bi kar tînin. Ji ber aloziya aborî ya heyî em neçar dimînin bi erzanî kar bikin. Hin caran derfetên kar li beramberî 20

hezar lîreyên Sûriyê peyda dibin, lê xwediyên kar 5 hezar lîreyî tenê didin. Ji ber ku em rojane debara malbatên xwe dikin, em neçar dimînin qebûl bikin. Li gel bihabûnê ev destheq têra pêdiviyên me yên bingehî nake. Hin caran derfetên kar peyda nabin, ji ber wê em nikarin xwarinê ji malbatên xwe re peyda bikin."
Apê Taha Ebdulrehman (60) malbata wî ji 8 endaman pêk tê. Di maleke bi kirê de dimîne. Apê Taha got, "Ez ji 18 saliya xwe ve vî karî dikim û pîşeyekî din nizanim. Di dema me de girîngî nedidan xwendinê. Ji ber wê min di vî warî de kar kir."

'EM DESTHEQÊN ERZAN QEBÛL DIKIN DA KU BÊKAR NEMÎNIN'

Apê Taha wiha axivî: "Ji ber ku hinek karker destheqê erzan qebûl dikin em mecbûr in mîna wan bikin û wiha domand: "Beriya çend rojan, min derfeteke kar qebûl kir. Min di du rojên sax de xilas kir. Digel ku diviyabû ez 50 hezar lîreyên Sûriyê bigirim, xwediyê kar 7 hezar tene dan min. Ez pê razî bûm. Digel ku ev miqdar di roja îro de li gel bihabûnê, têra tiştekî nake."

'YEKÎTIYA KEDKARAN HEWL DIDE MAFÊ HER KARKEÎ BIPARÊZ E'

Endama rêveber ya Yekîtiya Kedkaran ya herêma Cizîrê Hemîde Ferman da zanîn ku yekîtî hewl dide mafê her kedkarî biparêz e û wiha got: "Ji ber wê em destheqê karkerên endamên Yekîtiya Kedkaran bi awayekî guncew kontrol dikin û saetên kar ji wan re diyar dikin. Yekîtî hewl dide derfetên kar ji wan re peyda bike. Çi di rêxistinan de, çi di riya Yekîtiya Bazirganan be."
Îsal li ser asta herêma Cizîrê li derdora 12 hezarî karkerên jin û mêr beşdarî Yekîtiya Kedkaran bûne.

Histografya Kurdistanê = Heftanîn



Medeni FERHO

Em di serdemeke mîtolojiya dîrokê de dijîn.
Mîtolojiya dîrokê, gotineke pirr bi îddîa ye!.. Di wêjeya devkî ya Kurdan de, ev rastî heye û mînak e. Mîtolojî, bi fîgûrên nemir dagirtî ne, gotina "nemir", di wate û îradeya xwedawendî de tê bikaranîn û hişmendiya civakê zindî digire.
Di şerê 3mîn yê cîhanê de, lehengên Kurd destanan dinîvîsin. Di şerê li dijî çeteyên DAIŞê de cîhanê ev rastî erê kir. Dîtin ne "îddîa" ye rastiyek e. Îro jî, em di Cenga Heftanînê de dibînin ku Gerillayên Kurd, bûne fîgûrên nemir.
Şer ne dostê kesî ye!.... Lê dewşirmeyên Turk-î Islam, sed sal in, di bejahiya welat û qeraxên derya welat de di nava şer de ne… Şer, nêçîra gur e!.. Dewşrîmeyên Turk-î îslam jî xwe çêlîkên gur dibînin, Gur jî "dehbe"yekî bê ewle ye!..
Machawellî jî, behsa du cûre şer dike, yek di çarçoveya qanûnan de insanî, ya din jî heywanî!... Machawelî, ji bo "prensê" xwe jî, her du riyan jî pêşniyaz dike. Aqilmend, yan jî şêwirmendekî ku riya heywanî şanî "prens"e xwe bide newî heywan e.
Fernand Braudel jî, êrîşên Mogol û dewşîrmeyên Osmanî, wek "bela Xwedê" binav dike. "Bela Xwedê" jî, di literetûra Kurdan de, cureyekî heywanî ye.
Erîşên Dewleta Tirk yên li Heftanînê, li gorî Machyawellî jî, li gorî F. Braudel jî heywanî ne. Balkêş e, merşa neteweyî ya dewşîrmeyên Tirk jî, "şaristaniyê canawar" dike; ev jî, li dijî ruh û vijdanê însanî ye. Bi gotinek zimanê osmanî "mucîb-î teesûr"e. Ez gelê Tirk tenzîh dikim û dibêjim; "şaristaniya ceanawar", encama ruh û vijdanê xerab e, yê guruhên dewşîrmeyên wek Ziya Gokalp, Akîf Erosy û Erdogan e. Marş dewşîrmîst e!...
Şerxwaziya dewşîrmeyan, li xiş û hesabê sîstema kapîtalîst jîhatiye. Ji ber ku dewşîrme, hêza ku her dem ji bo şerê heywanî, ji bo şikandin û qelskirina îradeya gelan amade ye. Saziyên burjuwazî jî, wan baş bikartînin. Di şerê 3mîn yê cîhanê de baş bikartînin û dixwazin car din îradeya gelan dîl bigirin. Bê îrade kirin, tê wateya dîlgirtina dîrokê û ev jî koritî ye.
Mînaka ku em pê dizanin, gelê Kurd û korîtiya nezanîna dîrokê ye.
Piştî Têvgera Azadiya Kurd, bi taybetî piştî pirtûkên Ocalan, dîroka alternatîf û hîstografya Kurdistanê, hêdî hêdî di disîplînek têgihiştî de derkete holê. Ocalan, di nirxandin û vegotinên xwe de, têkildarî felsefeya dîrokê jî dibe. Lê dîroka felsefê û histografya tevlîhev nake. Ev giring e û dive her dîrokzan û lêkolînvan vê ratsiyê liber çavan bigirin.
Em, di mecburiyetek siyarbûnê de ne. Têgihiştin jî, bingeha hişmendiya şiyar e. Lewma û teqeze, dive em her bûyera li Kurdistanê, di tara dîrokê de bigirin, li gorî "mecburiyeta şiyarbûnê" binirxînin. Divê bi felsefeya doçrokê, dive bi histografya de bigîhînin nifşê paşerojan.
Mecburiyeta me, ji "berxwedanek giştî" ya gelê Kurd tê. Feryad û fîgana me li PDK û hêêzn Başûrê Kurdistanê ku şiyar bibin û rastiya dijmin bibînin jî ev e. Divê keske, bi berçavkên hespan li buyer û pêşketinên Kurdistanê ne nêre. Guhertinek meizn heye. Guhertin jî navê şoreşan e, gelê Kurd jî di guhertinek dîrokî de ye.
Bala xwe bidinê, li Tikriyê û Bakurê Kurdistanê, qirkirina siyasî ya li dijî jinan jî dane dets pê kirin. Ev tirs e, tirsa têkçûna Heftanînê ye. Lewma min di sernavê nivîsê de, gotina "hîstografya Kurdistanînê Heftanîne" bi kar anî. Em dîrokê dijîn!...
Dibê ku cîhana kapîtalîst, ji lêkirina navekî li şoresa Kurdistanê "îmtîna" bike. Erê, dibe ku saziyên demokrasiya burjuwa û qelemşorên wê, nexwazin karakterîstika Şoreşa Kurdistanê, ji netîdî ve werin. Dibê ku standardên dîrokî ku li gorî xwe formule kirine, ji bo Şoreşa Kurdistanê bikar neyînin.
Teqez e û misogere ku, li Kurdistanê guhertinek civakê çêdibe û ev guhertin jî bandore li civakên li heêrmê teva dike..
Bi bawerî dibêjim: Cîhan dibîne, lê dive werê zanîn ku ew "prensê" Machyawell'in!...
Di Şoreşa Fransa da, dîrokzanên cîhanê, ketin nava "mecburiyet"ê de û Şoreşa Fransa kirin navenda lêkolîn û lêgherînên xwe. Şoreşa Fransa wek navenda ronikirina mirovaniyê derxistin pêş û baş jî bikaranîn.
Rastî ew e ku, Şoreşa Fransa dîroka mirovên ji rêzê ye… Mirovên ji rêzê kî ne, civak e !... Dîroka Fransa jî, ne bi çînê rêveber û serdestî, bi gelê Fransa re, weke mîrateya histografya Fransa hate nirxandin. Ev baskê dîrokê, piştî şerê 2mîn yê cîhanê pêşket. Nîha jî, gelê Kurd wê serdemê dijî. Şerê Heftanîn jî mînaka vê ye û hîstografya Kurdistanê jî li Heftanînê tê nivîsandin û pêşkikeve.
Yanî; di şerê 3mîn yê cîhanê de, têkoşîna hêzên Gerilla li Heftanînê, li dijî kral û çarên modern tê kirin. Dewleta Tirkiyê, ne bi xwe, bi kral û çarên modern li dijî gelê Kurd şer dike. Kral û çarên modern, dewleta dewşirme, ku digotin "dewletek heydud" e, komên çete ava dike û fînanse dike, bi kar tînin û rê li ber guhertina civakan digirin.
Balkêş e û seyr e, Tirkiye bê pêrwa, ji Kurdistan (Suriye-Iraqê) heta bi Libyayê komên çete rêz dike, li dijî tevahiya cîhanê wek şantaj û gef bikar tine; dîse jî hêzên global, lîstîka sê meymunan didomînin.
Mîrateyek dîroka Kurdan heye, lê nivîskî nîne; winda ye, di qedexe, red û înkara qanunên zincîran de tune kirine. Qanunên zincîran, ji qanunên demokasiya burjuwa, bi gelekî dijwartir in.
Îşaret pê dikim; rewşek nû heye, nifşê nû xwedî baweriyên kozmîk in, asoyên mêjiyên wan fereh in, xewn û xeyalên wan azad in û ev nifş, rê li ber hişmendiyek nû vedike. Ev hişmendiya nû xwedî tez û antîtez e, bîrdoz e, disîplîn e û teorîye!..
Ev jî, bi serketina Heftanînê re wê histografya Kurdistanê û gelên li herêmê fereh bike.

Rêxistina Jinên Ciwan ya PYD`ê Konferansa xwe ya yekê ya Damezrîner li dar xist

Rêxistina Jinên Ciwan ya PYD'ê bi durişma `Bi rêxistinkirina jinên ciwan li ser bingehê felsefeya Serok Apo digihîje Sûriyeya demokratîk` Konferansa xwe ya yekê ya Damezirîner li dar xist û meclisa xwe ya Rojava ava kir.

Rêxistina Jinên Ciwan ya Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD) roja Înê Konferansa xwe ya yeke ya Damezrîner bi tevlîbûna 150 delegeyan ji Cizîr, Firat û Efrînê li dar xist. Konferans li Sandîkaya Karkeran ya li bajarokê Rimêlanê yê kantona Qamişlo li dar ket.
Nûnerên Kongreya Star, Meclisa Jinan ya PYDê û Yekitiya Jinên Ciwan di konferansê de amede bûn. Piştî deqeya rêzgirtinê, endama hevserokatiya PYD`ê Foza Yusif axivî û lidarxistina konferansê li jinên ciwan pîroz kir û got, "Bi têkoşîna ciwanan şoreşa Rojava dest pê kir û bûn pêşengên birêxitsinkirina civakê. Bi saya berxwedana ciwanan em li hemberî êrişên leşkerî, siyasî û aborî bi ser ketin."
Foza diyar kir ku şoreşa 19`ê Tîrmehê bi giyanê ciwanên ku hişmendiya desthildar red kirine, dest pê kir. Bi taybetî jina ku bi fikra xwe ya azad şoreşa ku banga azadî û mirovayiyê dike ava kir.
Piştî axaftinan sînevizyonek girêdayî rola jinên ciwan di birêxistinkirina civakê de hat nîşandan. Di dawiya konferansê de ji bo Meclisa Jinên Ciwan ya PYD`ê 13 kes hatin hilbijartin. Encamname û plansaziya Meclisa Jinên Ciwan ya PYD`ê hat eşkerekirin.
Çend biryarên hatîn girtin wiha ne:

-Jinan birêxistin bikin da rê li pêşiya kuştin, kiryarên li dijî jinan û zewicandina zarokan, bigirin.
-Dûrxistina ciwanan ji rêbazên şerê taybet.
-Perwerdekirina jinên ciwan da di qadên siyasî de xwedîrol bin.
-Divê jin rola xwe ya pêşeng di belavkirina fikirê neteweya demokratîk de bilîze.
-Ji bo parastina welat û civakê, divê jinên ciwan tev li refên YPJ`ê bibin.

'Ez ê hovîtiya dagirkeran bi pênûsa xwe ji cîhanê re ragihînim'

Endama Komîteya Wêjeya Rojavayê Kurdistanê Narîman Evdikê ku bi pirtûka xwe ya 'Berberoj' tevlî pêşangeha Şehîd Herekol bû wiha got: "Şervanên Serê Kaniyê rizgar kirîn û di riya wê de perçeyên bedena xwe dayîn Berberoj jiyana wan vedibêje. Bi rizgarkirina Serê Kaniyê ya ji dagîrkeran ezê Berberoj 2 jî binivîsim û hovîtiya xwînmijên gelê Kurd ji cîhanê re vebêjim. Ezê hovîtiya dagîrkeran bi pênûsa xwe ji cîhanê re ragihînim."
Nivîsa helbest, roman û çîrokan encama volkanên di hundirê mirov de dikele û bûyerên qewimîn e. Nivîskara jin û Endama Komîteya Wêjeya Rojavayê Kurdistanê Narîman Evdikê ku îsal bi pirtûka xwe ya bi navê Berberoj tevlî pêşangeha Şehîd Herekol bû, ji Ajansa nûçeyan ANHa re axivî.

'PÎRTÛKA BERBEROJ XWEDÎ HESTÊN GIRÎNG E'

Narîmanê diyar kir ku sala duduyan e ku bi berhemên xwe tevlî pêşangehê dibe û wiha axivî: "4 sal in pêşangeha Şehîd Herekol tê lidarxistin. Ez par bi du pirtûkên hevbeş, yek jê çîrok, ya din jî bîranîna şervanekê bû tevlî bûm. Îsal ez bi pirtûka xwe yê bi navê Berberoj tevlî bûm. Ji ber wê ez hestên kêfxweşiyê pir cuda di van kêliyan de his dikim. Min îsal şopa xwe bi nav û keda xwe li Pêşangeha Şehîd Herekol hişt û hêvî dikim wê xwendevan sûdê ji min bigirin.
Pirtûka Berberoj xwedîhestên girîng e."

'MÎN KÊLÎYÊN BERXWEDANÊ NIVÎSÎN'

Narîmanê naveroka pirtûka xwe wiha vegot: "Min xwest di pirtûka min de tişteke balkêş hebe. Ji ber wê min dest bi guhdarîkirina şervanan kir. Yên di şerê yekê yê Serê Kaniyê de, sala 2013'an li ber xwe dayîn û di riya azadî û rizgarkirina wê de parçeyên bedena xwe dayîn. Paşê min tevayiya kêliyên rizgarkirina Serê Kaniyê, ku bûbûm şahida wan, nivîsîn û kir pirtûk. Ez pir keyfxweş im ku min karî berxwedana şervanên rûmetê ya li hemberî tariya çeteyên ku dixwestin reşayiya xwe li ser bajarê aştiyê Serê Kaniyê bi cî bikin, bikim pirtûk û bigihe ber destê her kesî. Min kêliyên berxwedanê nivîsîn."

'ŞER BANDORA XWE LÎ WÊJEYÊ KIR'

Narîmanê bal kişand ser êrişa dewleta Tirk ya ser Serê Kaniyê û bandora wê ya îro li ser pêşengehê û wiha axivî: "Wêje jî di navê de, şer bandora xwe li tevayiya qadên jiyanê dike. Me 4 nivîskarên jin yên ji Serê Kaniyê xwe amade kiribû ku bi pirtûkên xwe reng bidin Pêşangeha Şehîd Herekol. Lê ji ber dagîrkirina Serê Kaniyê ji aliyê dewleta tirk û çeteyên wê ve, du nivîskarên me nikarîbûn bi berhemên xwe tevlî pêşangehê bibin. Ji ber wê em 2 nivîskar ji Serê Kaniyê bi pirtûkên xwe tevlî pêşangehê bûn."

'EZÊ HOVÎTÎYA DAGÎRKERAN BI PÊNÛSA XWE JI CÎHANÊ RE RAGIHÎNÎM'

Narîmanê da xuyakirin ku bi rizgarkirina Serê Kaniyê ji dewleta Tirk wê dest bi nivîsa Berberoj 2 bike û wiha dawî li gotina xwe anî: "Dema min Berberoj 1 nivîsî ez li Serê Kaniyê bûm. Min ew şervanên şer dikirin û bajar ji terorê rizgar dikirin dîtin û wan bixwe jî çîrokên xwe gotin. Nîha ez dihizirim ku Berberoj 2 binivîsim. Lê ji ber ku ez ne di nava kolanên Serê Kaniyê û şervanên wê de me, nivîsa wê zehmet e. Bi rizgarkirina Serê Kaniyê re ezê dest bi nivîsa Berberoj 2 bikim û hovîtiya dagîrkeran bi pênûsa xwe ji cîhanê re ragihînim."

Tundiya li ser jinê, hilweşandina civaka exaqî û polîtîk e

Binefş SARYA

Jin-dayîk deştpêka şaristaniyê jiyan bi destê wê dihat xurtkirin û civakîbûn li dora wê kom dibû. Piştî pêşketina hişmendiya mêrê serdest, pergala qiral-rahib û dewlet-neteweyan, hebûna jinê jî di nava civakê de hat tinekirin. Jina civak ava kirî û hêza çareseriyê bû kirin pîrhevaok û di nava agirê dojehê de şewitandin. Her ku hişmendiya mêr-dewletê pêş ket nirxê jin-dayikê jî kêm bû. Heta mirov dikare bêje di nava pergala feodal-kapîtalîst de bi ti awayî nirxê jinê nema. Bi pêşketina pergala kapîtalîst re hebûna jinê jî hat tinekirin û bû meta. Kesa ku civak diafirand, dayîka jiyanê bi demê re bi destê kurên xwe bû amûra dilxweşkirina mêran û li kolanan hatin firotin. Ya rast ne li kolanan tene, di binê navê zewacê de di hundirê malê de jî bê agahiya wê û dilê wê bi destûra bav, bira, mam, xal û rûsipiyên eşîrê li gorî dilê mêran bi bûçeyên cuda di hundirê sûka malê de hat firotin û navê wê firotinê jî kirin qelen-next yan jî xerca nava malê û li hin deveran jî kirin pereyên heqê şîrê dayîkê. Di binê navê zêdebûnê de bi jinan jî dan bawerkirin ku neçar in bizewicin û bibin xwedîmal, dayika zarokan yan jî hevjîna mêrekî ku qet nas nake. Lê ti kesî jê nepirsî ka pergala heyî dipejirîne yan na. Yan jî ti kesî nirx neda dengê wê. Ji bo mêrê feodal-dewletê nirxê jinê nema. Di çav û hişmendiya wan de sirf makîneya zarokçêkirinê, metaya têrkirina ajoyê mêran û xizmetkara bêheqdesî bû. Ev rewşa jinan di roja me ya îro de, ango di sedsala 21. de hê jî bênavber didome.
Ne firotin û makîneya zarokçêkirinê tene, di heman demê de di binê navê heskirinê de tên kuştin û li her derê mafê wan yê jiyanê ji destê wan tê girtin. Di pergala dewletên heyîn de jina hes bike tê kuştin û bi mêrkirinê re her roj rastî tundiya mêr û malbata mêr tê. Bêguman dema em dibêjin tundî meqseda me ne tundiya fîzîkî tene ye. Li gel tundiya fîzîkî her roj heta mirov dikare bêje her 5 xulekan carekê jinek yan rastî lêdan û kuştinê yan jî rastî gotinên xerab tê. Tundiya devikî bi qasî tundiya bedenî bibandore û derûniya mirovan xereb dike. Li her derê jin di binê navê şeref û namûsê de tên kuştin. Lê mirov her carê vê pirsê ji xwe dike; gelo ew peyva jê re tê gotin şerf yan jî namûs ma para jinan tenê ye. Lê mêr li kû dera van peyvan in, yan jî ma jin bi serê xwe li gorî hişmendiya wan ya paşketî xerabî kirine? Gelo ma ew mêrê ku pê re ketiye xetayan çima nayê cezakirin. Dema mirov li ser van mijaran dihizire mirov digihîje wê baweriyê ku kuştina jinan ne ji xetayê jinan e. Lewre mêr-dewlet dijminê jinan e; jin tên kuştin û rastî her cure tundiyê tên.
Ji bo ku em neyên kuştin û rastî tundiyê neyên, berî her tiştî pêwîstiya me bi xweparastineke xurt heye. Eger em bi bi sere xwe nikaribin xwe biparêzin wê demê pêwîst e em jin rêxistinên xwe xurt bikin û li dora rêxistina jinê ya sereke bibin yek. Dema jin baweriya xwe bi hêza rêxistina xwe ya jinê bîne û parastina jiyana xwe di binê sîwana hêza jinê de bibîne wê ti mêr-dewlet nikaribin êrişî wê bike. Wê ti jin di binê navê qaşo namûs û şerfa mêran de neyên kuştin. Mêrekî ku bixwaze jinan ceza bike, bila berî her tiştî xwe sererast bike û li gorî exlaqê civaka demokratîk tev bigere. Wê demê wê bizane yên ku ceza heq dikin ne jin in, hemcinsên wan bixwe ne. Ji bo ku kuştin û tundiya li ser jinê rabe pêwîstiya me hemûyan bi hişmendiya civaka demokratîk û hevjiyana azad heye.
Ji bo jiyaneke azad wekheviya zayendan ev xaleke bivênevê ye.

Lêkolîner û pisporê Tirkiyê: Dewleta Tirk NATO ji bo berjewendiyên xwe bi kar tîne

Lêkolîner û pisporê karûbarên Tirkiyê Mihemed Rebî Dêhî got, dewleta Tirk NATO ji bo pêkanîna hedefên xwe yên li herêmê, nexasim li Libya bi kar tîne û rewşa niha ya li hemberî polîtîkaya berfirehkirinê ya dewleta Tirk û parçebûna li herêmê, xeter e.

Lêkolîner û pisporê karûbarê Tirkiyê Mihemed Rebî Dêhî bi ajansa nûçeyan ANHA re li ser nakokî û aloziya li Libya û destwerdana dewleta Tirk ya li welatên erebî axivî.
Rebî Dêhî di destpêka axaftina xwe de wiha got: "Rewşa Libya xeter e. Ji ber aloziya Libya ji Sûriyeke nû re derfet çênabin. Lêbelê wê li pêşberî me Somaliyeke nû hebe ku çareya aştî yan jî danûstandinê dijwartir be."

'ROLA DEWLETA TIRK WÊ BIBE SEDEMA ŞERÊ CÎHANÊ YÊ SISIYAN'

Dêhî da zanîn ku tola dewleta Tirk wê cîhanê li pêş bijartetya Şerê Cîhanê yê Sisiyan bihêle. Li gel wê jî parçebûn di Yekîtiya Ewropayê (YE) de li ser pêwîstiya cezayên hişk heye. Li aliyekî din jî pirsgirêk di hundirê NATO de heye. Bi wê re jî gef li NATO li gel derfetgirtina Tirkiyê ya li gorî pêkanîna berjewendiyên xwe li herêmê, heye. Ew jî NATO dixe helwesteke aciz û şopînerê siyasetên Enqere bê rawestandina hedefên wê. Ji ber wê rewşa li Libya rojane bi pişgiriya Tirkiyê xetertir dibe.

'KOLANA EREBÎ DEWLETA TIRK NAPEJIRÎNE'

Lêkolînerê misirî wiha axivî: "Diyar e ku êdî Enqere bûye şirîka plana parçekirina nû ya herêma erebî. Herwiha hewl dide li ser bakurê Afrîka û gelek welatên Ereban serdest bibe û planên xwe pêk bîne. Lêbelê gelê Ereb êdî koma Ixwan ya baskê pêkanîner yê hedefên dewleta Tirk li herêmê red dike."
Têkildarî girîngiya Libya ji Enqere re û israra wê di sepandina hegemonyaya xwe de, Dêhî wiha got: "Piştî binketina Tirkiyê di serdestiya Misirê û binketina berjewendiyên wê li Sûriyê de, Libya ji Tirkiyê re nuqteya stratejîk e. Ji ber wê wek Libya wek nuqteya bicihbûna girîng ya stratejiya hebûna xwe li bakurê Afrîkayê û derbasbûna li kûrayiya wê dibîne. Li gel wê tevliheviyê li welatên herêmê yên mezin yên mîna Misirê ku projeya wê têk bir, çêdike."

Geir Pedersen: Xebata komîteya destûrê 24'ê Tebaxê dest pê dike

Piştî gerên bin ketîn, nûnerê Neteweyên Yekbûyî yê Sûriyê Geir Pedersen got, wê 24'ê Tebaxa bê kar û xebata komîteya destûrê ya Sûriyê ya li Cinêvê dest pê bike.
Di civîna online ya Meclisa Ewleyiyê ya têkildarî rewşa Sûriyê Pedersen diyar kir ku plana rûniştina gera sisiyan ya van diyalogan êdî piştrast bûye û wê 24`ê Tebaxê dest pê bike. Lê bi şertê ku tedbîrên rêwîtiyê neyên guhertin.
Geir Pedersen bang li rakirina tedbîrên yekalî yên li dijî Sûriyê kir û got, lewre cezayên yekalî yên li dijî Sûriyê hêza dewleta Sûriyê ya gihandina xwerek û pêdiviyên tenduristiyê yên guncaw ji bo pêşîgirtina li Koronavîrûsê, sînordar dike. Komîteya destûrê gelek civîn li

dar xistin û tê de nûnerên gelê Sûriyê yên rastî beşdar nebûn. Vê carê jî piştî hikumeta Sûriyê hilbijartinên Meclisa Gel ya Sûriye bi dawî kirin, ev ger çêbû û çavdêr texmîn dikin ku ev komîte bêçare maye.

RJAK'ê li dijî êrişên ser jinan daxuyanî da

Rêxistina Jiyana Azad ya Kurdistanê (RJAK) têkildarî êrişên ser jinan daxuyaniyek da. RJAK'ê di daxuyaniya xwe de diyar kir ku li Kurdistanê AKP û MHP li dijî jinan şer dimeşînin. RJAK`ê da zanîn ku destdirêjî bûye nasnameya rejima AKP û MHP'ê. Rejima faşîst ji bo jinan tevan xetereke mezin e. RJAK'ê bang li jinan kir ku li hemberî êrişan têkoşîna xwe xurt bikin.
Daxuyaniya RJAK`ê wiha ye; "Jinan bi taybetî jinên Kurd bi têkoşîn û berxwedana xwe mohra xwe li sedsala 21ê dan. Têkoşîn û bibiryarbûna jinan tirseke mezin xistiye nava dilê pergala kapîtalîst. Pergala kapîtalîst bi her awayî di nava kirîzek mezin de ye. Dixwazin kirîza heyî bi politikayên nijadperest û zayendperest çareser bikin. Pergala otorîter û faşîst herî zêde bi politikaya dijberiya jinan dixwazin li ser lingan bimine. Mînaka vê li tevayiya welatên cîhanê bi politikayên cuda pêk tê. Li seranserê cîhanê, dijberî û dijminiya jinan bilind bûye. Bêguman sedema vê dijmintiyê, bi têkoşîna azadiya jinan ve girêdayî ye. Dijberî, kuştin û destdirêjiya li jinan bi vê politikayê ve girêdayî ye. Ev rewş ne pirsgirêkeke civakî ye, ne jî çawa didin xuyakirin pirsgirêkeke di navbera jin û mêran de ye.
Hedefkirin, kuştin û destdirêjiya li jinan politikaya dewletê bi xwe ye. Li seranserê cîhanê rejimên dîktator û faşîst li hemberî jinan şer dikin. Rejima faşist ya AKP û MHP'ê berdevkiya vê politikayê dikin. Bi zêhniyeta DAIŞ`ê dixwazin jinan bi rê ve bibin û vê politikayê li hemberî tevayiya jinên Rojhilata Navî pêk bînin. Li Kurdistanê AKP û MHP şer li dijî jinan dimeşînin. Em RJAK li hemberî van polîtîkayên sîstema kapîtalîst yên kuştin, devavêtin û destdirêjiyê sîstema kapîtalîst, emê têkoşîna jinan li her qadê mezin bikin û li ber xwe bidin. Bi têkoşîna xwe pêşengiya jiyana azad bikin. Emê li hemberî sîstema faşîst û dagirker bi vîna ku bi aqil û dilê jinan xurt bûye, li ber xwe bidin.
Em di serî de bang li jinên Rojhilata Navî û jinên cîhanê dikin ku li hemberî kuştinên jinan dengê xwe bilind bikin. Wê jin bi ser bikevin û azad bibin."

'PKK nûnera azadîxwaziyê ye ji bo wê Tirkiye şerê wê dike'

Rojnamevan Ferec bal kişand ser êrişên dewleta Tirk û got, "Tirkiye şerê PKK'ê nake, şerê gelê Kurd dike. Ji bo çi PKKê dide pêş, ji ber ku nûnertiya şerê gelê Kurd ya li dijî Tirkiye dike. Divê gel fêm bike PKK nûnertiya azadîxwaziyê dike." Balafirên şer yên dewleta Tirk xaka Başûrê Kurdistanê rojane bombebaran dikin. Bi vê dixwazin gundan vala bikin. Bêdeniya başûrê Kurdistanê wisa kiriye ku Tirkiye êrişên xwe bidomîne. Di roja îro de başûrê Kurdistan di dema xwe ya herî xirab de ye. Lewre rêveberên siyasî yên niha başûrê Kurdistanê bi rê ve dibin ne bi xwe ne, nikarin li ser lingê xwe rawestin û nikarin xwe bi xwe xwe bi rê ve bibin. Hinek din başûrê Kurdistanê bi rê ve dibin. Beşeke mezin serbixweyiya xwe ji dest daye. Ev jî bûye sedem ku dijmin bi hesanî destwerdanê bike.

Qesra Şîrîn-LOZAN-Sêmalk

Ahmet AKTAŞ

97 Sal berê 24ê Tîrmehê, li bajarê Lozana Swisrê, bi biryara hinek dewletan, Kurdistan fermî hat perçekirin.
Bi vê fermana navdewletî ya bi navê PEYMANA LOZANÊ, bû 4 parçe û weke Beşikçi jî gotibû, êdî li goreyî zagonên navdewletî jî bû "mêtingeha navdewletî"!
Ev parvekirina dudan bû. Lê weke em zanin cara yekemîn ji aliyê Imparatoraya Osmanî û Sefewiyan ve, li bajarê Qesra Şîrîn ya Îranê bi navê PEYMANA QESRA ŞÎRÎN, Kurdistan bûbû 2 parçe û li goreyî vê biryara bêbext a vê peymanê, heta roja îro jî ew sînorên hatibûn destnişankirin di navbêna dewleta Iranê û Tirkiyeyê de her dewam dike.
Lê li şûna Sultan Muradê Osmanî niha sultan Receb, li şûna Şah Ebbas jî Şah Ruhanî li ser textê mêtingeriyê rûniştine.
Cara dudan jî, dema li goreyî projeya sedsala 20î ya Sykes-Picot, Rojhilata Navîn, di serî de Britanya û Fransa di navbêna dewletên hegemon ên cihanî de hat parvekirin, Kurdistan jî li goreyî berjewendên dewletên xwe, kirin 4 parçê û radestî dewleta Tirk, Îran, Iraq û Sûriyê kirin.
Mirov bala xwe didê, agahiya gelê Kurd jê nîne, hinek din li ser maseyê rûniştine û li goreyî kêfa xwe xaka me, welatê me û gelê me parçe parçe dikin!.
Dema ku mirov van dîrokên xwînmij û wêranker û qirker dixwîne, dil û hinavê mirovan disoje.
Lê ez bawer dikim mijara niha ku ez ê bibêjim, dibe ku hîn pirtir dil û cerg û serê mirovan biêşîne. Erê heta niha hêzên biyanî em û welatê me parçe kirin, belê niha, ew pira SÊMALKA çi ye gelo? Ew xendekên di navbêna Başûr û Rojava de dihatin kolan, ji bo ku gelê me derbasî cem hevdu nebin çi bû?
Ez ji vêna re dibêjim parçekirina 3'yan û ya bi destê Kurdan e! Ma gelo ev kiryar, ev kar û ev hilwest ne xedartir e ji yên din? Êdî hûn çi navî lê dikin hûn zanin!
Ev bûyerên xedar û dijwar û qirker hemû ji bo çi hatin serê me? Bê gûman, ji nezanî û bê rêxistînî û bê rêberiya xurt bû. Eger rêberiya me ya zana û têgihiştî û bi dil û can hezkirê jiyanek azad ji bo welat û gel û mirovahiyê hebû ya, hilbet ti hêz û dewletên biyanî ew ê nikaribûna em parçe parçe bikirina.
Lê belê ev sedsala nuh a 21'ê, wê encama wê nebe weke sedsalên berê. Ji ber ku êdî gelê Kurd û gelên Kurdistanî ne bê Rêber in jî û ne bê rêxistinin jî. Her du jî hene û ew taybetmendiyên hatin gotin hemû jî hene û gel bi xwe jî gelek serwext û zana bûye. Êdî li her çar parçeyên Kurdistanê û li derveyî welat jî hesab ji gunehkaran, tawanbaran û xiyanetkaran tê pirsin û şoreş gav bi gav pêşve diçe.
Li parçeyî herî biçûk li ROJAVA şoreş pêk hatiye. Pêla ba û bahoza şorêşê derbasî derveyî Kurdistanê jî bûye; çûye heta nava dewletên ku welatê me parçe kirine, çûye ber deriyê xaniyê ku PEYMANA LOZANÊ hatiye nivîsandin jî û hesab ji wan jî tê pirsîn. Mirov êdî dikare bêje; çerx berovajî hatiye zîvirandin, "mêtingeriya navdewletî" veguheziye bûye: "ŞOREŞA NAVNETEWEYÎ"!

Li Reqa kongreya yekê ya Partiya Paşrojê ya Sûriyê şaxê Idlibê hat lidarxistin

Partiya Paşrojê ya Sûriyê şaxê Idlibê bi durişma "Sûriya demokratîk ne navendî, xurtkirina Rêveberiya Xweser û QSD`ê" li bajarê Reqa kongreya xwe ya yekê li dar xist.

Şervanê Hêzên Erkê Xweparastinê Mustefa Hito ku 15'ê Tîrmehê bi nexweşiyê şehîd bûbû, bi merasimekê biheybet li goristana Şehîd Delîl Sarûxan ya bajarê Qamişlo hat veşartin.
Welatiyan cenaze ji ber avayiya meclisa taxa Enteriyê ya bajarê Qamişlo girt û bi kerwanekî ji dehan erebyan birin goristana Şehîd Delîl Sarûxan.
Cenaze li goristanê bi durişman hat pêswazîkirin û merasimek hat lidarxistin. Piştî rêzgirtinê endamê Meclisa Malbatên Şehîdan Isam Îbrahîm sersaxî ji malbata şehîd re xwest û soza şopandina xeta şehîdan da.
Ji rêveberên Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD) Feyroşah Remedan axivî û got, bi saya şehîdan herêm di nava aramî û aştiyê de ye. Her wiha bal kişand ser êrişên dewleta Tirk ya dagîreker û got, "Dagîrker çi dikin bile bikin, di dawiyê de wê

bin bikevin. Lewre em hêz û xwe ji şehîdên xwe û ramanê Rêber Abdullah Ocalan digirin."
Ji fermandarên Hêzên Erka Xweparastinê ya herêma Cizîrê Beşîr Ebdulkerîm jî got, "Şehîd Mustefa tevî temenê xwe yê mezin ji yên destpêkê bû ku tevlî Hêzên Erkê Xweparastinê bû. Her tim moral û destek dida hevalên xwe û ruhê welatparêziyê di nav wan de diçand."
Di merasimê de, biraziyê şehîd Mustefa, Hisên Elî Hito çeka apê xwe rakir û soza şopandina xeta wî da.
Endamê Meclisa Malbatên Şehîdan Ziwer Şêxmûs nasnameya şehîd xwend û radestî malbatê kir.
Di dawiya de cenazeyê şehîd Mustefa Hito di nava durişim û tiîliyên dayîkan de hat veşartin.

Fermandarê artêşa Emerîka serdana Israîlê kir

Di demekê de ku nakokiyên di navbera Îranê û hevalbedên Emerîka yên li Rojhilata Navî de pir bûne, generalekî emerîkî yê payebilind ji nişka ve serdana Israîlê kir.
Associated Press da xuyakirin ku serokê Desteya Hevbeş ya Erkanan, general Mark Millie bi fermandarê artêşê û istixbarata Israîlê re li barageha hewayî ya başûrê Israîlê civiyaye û bi riya online bi serokwezîr Benyamîn Netenyahu re jî civînek li dar xistiye.
Piştî êrişa hewayî ya li ser paytexta Sûriyê Şamê bi çend rojan ev serdan çêbû. Çawa ku tê zanîn di êrişa hewayî ya li dijî Şamê de digel 5 kesên biyanî

endamekî Hizbullahê ku Îranê piştgiriya wê dike, hatin kuştin. Piştî du saetan artêşa Israîlê da zanîn ku bersiva êrişên li dijî Colanê ya ku di destê Israîl de ye dane û bi helîkopteran êrişî gelek nuqteyên hêzên hikumetê kirine.
Artêşa Israîlê da xuyakirin ku li başûrê Sûriyê li nuqteyên çavdêriyê û sîstema komkirina agahiyên istixbaratê dane.

Datayên bûyera balafira Îranê hatin zelalkirin

Fermandariya Navendî ya Emerîka datayên bûyera balafira rêwiyan ya Îranê ya li asîmanê Sûriye difiriya, zelal kirin.
Şeva Pêncşema borî balafireke Îranê ya rêwiyan li Sûriyê rastî astengiya balafirên Emerîka hat. Têkildarî mijarê, Fermandariya Navendî ya Emerîka li ser hesabê xwe yê Tiwtterê diyar kir ku piştî balafira Îranê ya rêwiyan li ser li asîmanê baregeha Tenef ya leşkerî geriya, wan jî erkekî asîmanî yî rûtinî dûrî balafirê bi hezar metreyî pêk aniye.
Fermnadariyê da zanîn ku ji bo misogerkirina ewleyiya leşkerên koalisyonê li bargehê ev erk pêk anîne û diyar kir ku erkê wan li gorî pîvanên navndewletî pêk hatiye.
Li aliyekî din jî Berdevkê Wezareta Karê Derve yê Îranê Ebas Musawî da xuyakirin ku têkildarî bûyerê hê jî lêpirsîn dewam dike û got, emê tedbîrên qanûnî û siyasî bigirin.

Şêniyên Qamişlo Şehîd Şoreşvan spartin axê

Şêniyên bajarê Qamişlo bi merasimekê cenazeyê şervanê QSD`ê Talal Ehmed (Şoreşvan Qamişlo) li goristana Şehîd Delîl Sarûxan spartin axê.
Talal Ehmed (Şoreşvan Qamişlo), 28`ê meha Hezîranê li Reqa di êrişeke şaneyên veşartî de şehîd bûbû.
Di merasima li goristanê de piştî rêzgirtinê endamê Meclisa Malbatên Şehîdan İdan El-Lîn sersaxî ji malbata şehîd Şoreşvan re xwest.
Di merasaimê de endamê meclisa giştî ya Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD) Ebdulkerîm Sarûxan jî cangoriyên azadiyê bîr anîn û got, "Vê şoreşê neteweyên li Sûriyê hemû li hev kom kirin. Ev proje projeya herî

baş ya sedsala 21`ê ye. Ji ber wê dijminên me êrişî me dikin. Divê em jî yekdest bin û di riya şehîdên xwe de bimeşin. Rêber Abdullah Ocalan ev rê ji me re hilbijartiye".
Piştî axaftinan belgeya şehadetê radestî malbata şehîd hat kirin. Paşê cenazeyê şehîd ji aliyê hevalên wî ve bi slogana 'Şehîd Namirin' û tiîliyên dayîkan hat veşartin.

Artêşa Iraqê: 4 moşek li barageha leşkerî ketin xwarê

Artêşa Iraqê bi daxuyaniyekê ragihand ku 4 moşekên Katyûşa li ser baragena leşkerî ya Koalisyona Navdewletî ya li başûrê Bexdayê ketin xwarê. Hat diyarkirin ku ziyana madî tenê çêbûye.
Moşek li barageha Besmayê ketin xwarê ku tê de leşkerên Spanya di çarçoveya têkoşîna koalisyonê ya li dijî çeteyên DAIŞ`ê de hene.
Had zanîn ku hedefa moşek û topên hewanê baragehên hêzên koalisyonê ne. Mehên borî jî li

nêzî balyozxaneya Emerîka ya li Bexdayê moşek ketibûn xwarê. Emerîka komên çekdar yên Îran serkêşiya wan dike tewanbar kirin.
Heta niha jî ti komên çekdar êriş negirtine ser xwe.

Artêşa Libya: Çeteyên Sûrî li Terablusê bi cilên polîsan digerin

Gerînendeyê rêveberiya Tewcîh El-manewî ya fermandariya giştî ya artêşa Libya serbaz Xalid Mehcob ragihand ku beşa yekê ji çeteyên Sûrî piştî perwerdekirinê ji hêla Wezareta Hundir ya hikumeta Wîfaqê ve, bi cilên polîsan daketin peytexata Terablusê.
Piştî rapora komîteya cezayên navneteweyî ya derbarê Libya de ku hatiye piştrastkirin dewleta Tirk çeteyan vediguhêze welat, serbaz Xalid Mehcob ji tora El-Erebiyê re diyar kir ku komek ji çeteyên Sûrî li baregeha Tekbalî

ya li paytexta Terablusê hat perwerdekirin û bi cilên polîsên libyayî daketin kolanan û dest bi erkê xwe kirin.
Di dîmenan de diyar bû ku endamên çeteyên Sûrî bi cilên polîsên libyayî perwerdeya xwe li baregeheke li başûrê paytexta Terablusê dibînin.

Artêşa Isralê li Qinêtre êrişî pergala asîmanî ya Sûriyê kir

Dazgehên çapemeniyê ragihandin ku artêşa Israîlê êrşî pergala parastina asîmanî ya hêzên hikumeta Sûriyê kiriye.
Li gorî Tora Erebiye, artêşa Israîlê bi du moşekan ûrişî pergala asîmanî ya hêzên hikumeta Sûriyê ya li baregeha Qinêtre kirin.
Lê heta niha encama topbaranê nehatiye zanîn.